



www.amude.com - navenda çanda kurdî

04.11.2003 - 18:22


## Dr. Burhan Yasîn: "PDK û YNK li milletê xwe guhdar nakin û dixwazin Iraqê vegeerînin sîstema wê ya erebî ya berê!"

**Hevpeyvîn: Sîrwan Hecî Berko**

[sirwan@amude.com](mailto:sirwan@amude.com)

*BONN (amude.com) - Şemiya borî, li bajarê Bonnê li Elmanyayê, konferensek ji aliyê NAVEND li ser pirsra referandum li Başûrê Kurdistanê pêk hat. Yek ji beşdarên vê konferansê Dr. Burhan Yasîn ji zanîngeha Lund a swêdî bû.*

*Li ser referandum û armancên wê min bi Dr. Burhan Yasîn re ev hevpeyvîn kir:*



© amude.com  
Dr. Burhan Yasîn (wêne: S.H.Berko)

### **MALPERA AMÛD: Tu ji bo çi referandumê ji bo Başûrê Kurdistanê giring dibînî?**

**DR. BURHAN YASÎN:** Ez bawer dikim, ku kurd li Başûrê Kurdistanê demeke mêtûyî ya gelekî giring derbas dikin.

Dewleta Iraqê hatiye helweşandin, dewleteke bi navê Iraqê tune ye. Ev tiştekî gelekî giring e. Ji bo kurdan niha derfetek heye ku bikaribin nexşeya deverê biguherin. Di babeta xwe de, min du glopên sor hilkişandin. Yek ji wan ew e, ku kurd niha di prosesa çêkirina dewletekê de ne, ku piştê bi vê dewletê re têkevin diyalogê de ji bo dozkirina mafên xwe? Bi rastî ev tiştekî paradoks e.

Pirsra din jî ew bû, ku aye tiştek wiha heye, ku 50 salan xelkê kurd û partiyên siyasî li Başûrê Kurdistanê ji bo demoqrasiyê xebatê dikin û niha ev demoqrasî bi xwe bibe amrasek di destê neteweya serdest de, ku vê demoqrasiyê ji bo ferzkirina destûrekî li ser kurdan, ku kurd bi xwe naxwazin, bi kar bînin?

Bi qenaeta min dewleta Iraqê xwedî nasnameyeke erebî ye û stratîjiya wê jî erebî ye. Herweha Iraq endameke di sîstema siyasî ya erebî de, ku ji 22 dewletên erebî pêk tê. Tiştê xerîb ew e, ku kek Mesûd û mam Celal û siyasethanên di Partî (PDK) û Yekîti (YNK) de hewl didin ku Iraqê careke din vegeerînin wê sîstema berê. Bi rastî ev jî paradokse mezin e.

Dema me niha gelekî kêr e. Ez bawer im çend meh mane. Eger Kurd di van mehan de ne kevin ser pê û hewl nede ku referandumekê pêk bîne, destûra Iraqê dê bête danîn û eger destûr hate danîn, em ê bikevin xeta paş destûrê. Wê demê em ê nema bikaribin tiştekî bizivîrînin paş.

### **Gelo ji bo gava serxwebûnê dê piştgiriya cîhanî hebe? Kurd dikarin gaveke wiha bavêjin bêyî ku dijminan ji xwe re çê kin?**

Ez dikarim wiha bêjim, ku dijayetiyeke bi hêz li beramberî vê meselê tune ye. Lê ligelbûneke bi hêz jî nîne. Yugoslaviya û welatên Sovyeta berê mîna lîtwaniya, Stoniya, Lataviya û welatên din, bi alîkarî û amadekirina navneteweyî nehatin çê kirin. Ew daxwaza wan miletan bû. Ew millet derketin ser cadê û doza serxwebûnê kirin û bi xwe jî serxwebûna xwe îlan kirin. Û haletên din jî hene, ku hêza navneteweyî nikarîbûn li hemberî serxwebûna hin dewletan tiştekî bikin. Di nerîna min de, divê kurd vê pirsyarê ji xwe bikin: "Gelo em dikarin tiştekî wisa bikin?" Em ji derve dest pê ne kin, divê em carekê li cem xwe dest pê bikin. Meseleya referandum çareser nabe, ger em sihra federalîzm û autonomîzmê helneweşînin.

### **Di nerîna te de, ji bo çi hêzên siyasî yê kurdî li Başûrê Kurdistanê doza federalîzmê dikin û serxwebûna xwe naxwazin?**

Di baweriya min de, xwendineke kulturî, felsefî û siyasî heye. Di 50 salan de, di bin dirûşmên 'Azadî ji bo Kurdistan û demoqrasî ji bo Iraq' kulturek di nav kesayetiyên siyasî yên kurdî de çê bûye. Mirov bi şev û rojekê ji vê kulturê xelas nabe. Tevergera Kurdî ji bo wan dirûşman şer kiriye, şehîd dane û xebat kiriye. Û xwendina siyasî ya stratîjî de giring e. Partî di wê baweriyê de ne, ku di zirûfên herêmî û cihanî de, ew nikarin behsa Kurdistanê serbixwe bikin. Ew careke din ji bo hundir ji derve dest pê dikin. Bi rastî ew hatine bestin bi felsefeya otonomîzmê û federalîzmê, yan jî bi kêmanîna neteweya serdest. Dibe ku ew li dij meseleya referandum û doza serxwebûnê ne, ji ber ew vê tevgerê ji xwe re weke munafis di meseleya desthilatê de dibînin.

### **Partî dibêjin ku referandum mafekî kurdan ê rewa ye, lê bi xwe ti gavên praktîk navêjin. Sedemên vê helwestê çi ne?**

Partî dixwazim hem bi dilê milletî bi axifin û hem jî bi dilê xwe. Ew siyaseta xwe dikin û ji millet re dibêjin 'ev mafê we ye, lê hûn niha nikarin'. Bi rastî jî partî ditirsin, ku bi sedhezaran kurd li Hewlêr, Kerkûk û Silêmanî derkevin ser cadê û ji nav wan partiyên teze derkevin meydanê û desthilata Partî û Yekîti kêm bibe. Bi rastî helwesta wan a neyênî li hemberî referandum hem berdeambûneke dîrokî ye li ser kultur, raman û felsefeya otonomîzîmê, hem jî xwendineke siyasî ye ji rewşa niha ya Kurdistanê û hem jî tîrsa windakirina desthilatê ye.

### **Gelo ger partî rê ji bo pêkanîna referandum venekin, referandum dê çawa pêk were?**

Ev pirs gelek baş e. Bi rastî ez şik dikim, ger Partî û Yekîti bi rastî beramber meseleya referandum negatîv bin, ev tevergera niha wekî ku heye, têrê nake. Şer ew e, ku cada Kurdistanê bête hejandin û ev jî bi sed-dused kesan pêk nayê. Ji bo dirûşma 'Referandum ji bo Kurdistanê azad' pêwîste ku bi hezaran kes dakevin cadê û ji Emerîka, Ingilîz û rojnamevanên li wê derê bête xuya kirin, ku milletê kurd tiştêkî din dixwaze. Ev tevger bi zehmetî çê dibe. Enerjiyeke gelek mezin gerek e. Herweha divê Kurdên ji derve biçin Kurdistanê û li gel kurdên li welat tevgerê xurt çê kin.

### **Ma Emerîka dê bihêle ku kurd xwe ji Iraqê veqetînin?**

Du aliyên vê meseleyê hene. Li aliyekî, ger kurd bi sedhezaran derkevin cadan û êşkere bikin, ku ew tiştêkî din dixwazin, ew nikarin bêtne red kirin. Li aliyê din, bi rastî erkê kurdan e, ku ji emerîkiyan re êşkere bikin, ku di cîhana islamî de cada Kurdistanê tenê li gel Emerîka ye. Ta bi Tirkîyê, dosta Emerîka ys kevn û ya ku hesabên stratîjî li ser hatine kirin, 70% ji milletê wê antî emrîkî ne. 90% ji kurdan li gel Emerîka ne. Divê emerîkî vî tiştî bizanibin. Mirov dikare li ser vê yekê hin hesabên stratîjî ava bike, lê aliyê kurdî ta niha nikarî projeyên hêja bidin emerîkiyan ku hesabên stratîjî li ser ava bikin.

### **Tu li ser qeleqa Tirkîyeyê ku kurd li Başûrê Kurdistanê serxwebûna xwe îlan bikin. Gelo tiştêkî di destên tirkan de heye ku bikin, an jî ev qerebalixa wan vala ye û tenê ji bo tirsandina kurdan e?**

Ev pirsêke pir giring e. Min di gelek cihan de nivîsandiye, ku kurd hesabekê pir mezin ji Tirkîyeyê re çê dikin, ku ew lê hêja be. Tirkîyê nikare vê xeletê bike. Ger tirk bêyî erêkirina Emerîka bi hêzeke leşkerî bêne Başûrê Kurdistanê, ew ê paşeroja xwe ya stratîjî têk bibin. Tirkîyê dixwaze îro ji meseleya qubrisê xelas be, naxwaze Qubriseke din çê ke. Eger îro Tirkîyê bi nerazîbûna Emerîkayê bête Kurdistanê, ew ê dijî Emerîka bê. Çimkî niha di warê qanûnî de, Emerîka niha weke dagîrker berpirsîyara vî erdê dewleta ku jê re dibêjin "Iraq" e û li gel wê jî Kurdistan. Pêwîst nake ku em pêşmergeyên xwe bişînin şerê tirkan. Min di nameyekê de ji bo hikûmetên Kurdistanê nivîsand, ku Tirkîyê nikare bi hesanî bête Kurdistanê.

### **Neistiqrariya li Iraqê ji bo kurdan derfetek e baş e ber bi serxwebûna Başûrê Kurdistanê?**

Bi rastî akterên mûnasib nînin ku tiştêkî çê kin. Bi şêweyeke giştî, neistiqrariya Iraqê ji bo kurdan xêrek e. Lê Partî û Yekîti sûdê ji van êrîşên li dijî Emerîka wernagirin. Wan daye li ser rêyekê, ku Iraqê careke din bi hêz bikin. Ew dixwazin careke din sîstema siyasî Iraqê ya erebî vegerînin.

■ vege rûpela destpêkê

Vê rûpelê çap bike

copyright © 2000-2002 amude.com [ info@amude.com ]